Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1128 | 24-Berfanbar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Pirtûkxaneya Şehîd Reşîd Serdar bûye cihê xwendin û lêkolînê



Ciwanên Mexmûrê diyar kirin ku xwendin ji bo her temenekî pir girîng e û bang li ciwanên wargehê kirin ku xwendina xwe bi pêş bixin ku dîroka xwe hîn baştir nas bikin û li cîhanê bidin nasîn.

Pirtûkxaneya Şehîd Reşîd Serdar bi pêşengtiya Komelên Ciwanên Mexmûr (KCM) û Yekîtiya Xwendekarên Azad (YXA) li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî ya Mexmûrê di 20'ê Mijdara 2015'an de hatibû vekirin. Pirtûkxaneya li ser navê fermandarê mezin Şehîd Reşîd Serdar ku di Tevgera Azadiya Kurdistanê de weke Egîdê duyem tê binavkirin hat vekirin, ji bo xelkê Wargehê bûye navenda xwendin û lêkolînê.

'XWENDIN JI BO HER TEMENEKÎ PIR GIRÎNGE'

Jina ciwan a bi navê Xelat Nerexî di destpêka axaftinên xwe de vebûna pirtûkxaneya Şehîd Reşîd Serdar pîroz kir û wiha got: "Xwendin ji bo her temenekî pir girînge, piranî ciwan berê xwe didin pirtûkxaneyê û dixwînin. Ji bo em xwe nasbikin, xwe pêşbêxin û dîroka xwe bizanibin pêwîste em bixwînin. Her wiha rêjeya xwendinê ne tenê di civaka me de, di tevahî cîhanê de pir kêm bûye. Ez bang li tevahî gelê Kurd bi taybet ciwanên wargehê dikim ku xwendina xwe pêşbêxin. Ji bo em hîn zêdetir bibin xwedî zanist, dîroka xwe hîn baştir nasbikin û li cîhanê bidin nasîn, pêwîste em bixwînin."

'ELEQEYA JI BO ZANÎNÊ PIR KÊM E'

Her wiha xwendevanê Peymangeha Şehîd Kerîm Kato, Mahîr Tûnç jî girêdayî heman mijarê axivî û wiha got: "Armanca vebûna pirtûkxaneya me ji bo em hîn zêdetir nasnameya gelê xwe, heqîqeta gerdûn û civaka xwe nasbikin. Her wiha ji bo em ji hizirê qalibgirtî û sîstema kapîtalîzmê dûrbikevin û hizirên xwe derbazî ser rûpelan bikin e. Wek tê zanîn eleqeya ciwan û xwendevanên me ji xwendin û zanistê re pir kêm e. Vebûna vê pirtûkxaneyê ji bo gelê me bi taybet ji bo ciwanên me yên niha pir girînge. Ji bo em gelê xwe, dîroka xwe nasbikin divê em bixwînin. Eger em nexwînin, em ê di derbarê demborî û jiyana xwe ya niha de ti zanînan qezenc nekin. Di pirtûkxaneya ku niha hatî vekirin de gelek cûrên pirtûkan û her wiha gelek derfet jî hene, ji bo vê jî divê ciwanên me bixwînin."

'DIVÊ EM BIXWÎNIN Û BIDIN XWENDIN'

Tûnç di berdewama axaftinên xwe de anî ziman ku sîstema kapîtalîzim û hêzên dagirker dixwazin ciwanên wargehê bi doxmatîzmayê ve girêbidin û wiha pêde çû: "Ji bo ev doxma û hizirê qalibgirtî ji holê rabe, divê em bixwînin û bidin xwendin. Pêwîste em bi heskirin rûpelên pirtûkan vekin, ji bo zanînê zanist û ji bo zanistê jî xwendin pêwîste. Ji bo em deriyê zanîn û zanistê vebikin, divê em rûpel bi rûpel dîroka ku hatiye nivîsandin lêkolîn bikin. Eger li ser xwendinê mereqa me çênebe, emê her tim di cihê xwe de bijmêrin. Gelek pirtûkên bê hêjmar di pirtûkxaneyê de hatine bicihkirin, ji wêjeyê bigre heta çand û dîroka Kurdan hatiye nivîsandin, ji bo em jî xwe bi dîrok û civakê re bi pêş bêxin, pêwîste em bixwînin. Xwendin ji bo her mirovekê pêwîstiyeke. Çawa ku şoreşgerek nikare bê çeka xwe şer bike, gulek nikare bê av şîn bibe, mirov jî bê xwendin ne xwediyê tiştekê ye. Ji ber ku mirovên xwendî, mirovên zana, kêrhatî û yên ku civaka xwe û demboriya xwe nasdikin e. Ji bo em jî ji xwendinê bê par nemînin divê em bixwînin û pirtûkên ku em dixwînin jî bi derdorê xwe re parvebikin."

Mahîr Tûnç di dawiya axaftinên xwe de bang li tevahî ciwanê wargehê kir ku bixwînin. Her wiha anî ziman ku derfetên niha di destê wan de hene, li gelek deveran nînin û ev tişt got: "Pêwîste em hemû bi hev re destê xwe bidin hev, ev kar û xebatên ku li vê pirtûkxaneyê tê meşandin bi serbilindî biserbixin. Yên ku bixwazin xwe di aliyê hizir û bîrdozî de pêşbêxin, ev pirtûkxane wê ji bo wan bibe derfetek."

# Bandora Edebiyata Kurdî ya Nûjen



Edebiyata kurdî ya nûjen, beşeke wêjeya kurdî ye ku ji nîveka sedsala 20an heta îro pêşketiye û cihêreng bûye. Di vê serdemê de nivîskar û helbestvanên kurd bi bikaranîna teknîkên edebî yên nûjen û bikaranîna ziman dest bi berhemdayîna berhemên edebî kirin. Edebiyata kurdî ya nûjen bi guherînên civakî û bûyerên siyasî pêş ket û li ser mijarên cihê rawestiye.

**Çend taybetmendiyên girîng ên edebiyata kurdî ya nûjen ev in:**

1. Ziman û Pergala Nivîsandinê: Edebiyata Kurdî ya nûjen berhemên ku bi zarava û şaxên zimanê Kurdî yên cuda hatine çêkirin dihewîne. Her wiha zaravayên kurdî yên wek Kurmancî, Zazakî û Soranî ku bi alfabeya latînî hatine nivîsandin cihekî girîng digirin. Ev cihêrengiya zimanî, dewlemendî û cihêrengiya wêjeya kurdî radixe ber çavan.
2. Nasname û Pirsgirêkên Civakî: Wêjeya Kurdî ya nûjen li ser nasnameya Kurdî, hişmendiya etnîkî û pirsgirêkên civakî disekine. Di van berhemên edebî de gelek caran behsa zehmetiyên kurdan, pêvajoyên siyasî û guhertinên civakî tê kirin.
3. Koçberî û sirgûnî: Ji ber nakokiyên siyasî û sedemên aborî gelek kurd ji gundên xwe koçî bajaran an jî welatên cihê bûne. Edebiyata kurdî ya nûjen van serpêhatiyan bi destxistina mijarên koçberî û sirgûnê nîşan dide.
4. Pirsgirêkên Jin û Zayenda Civakî: Di wêjeya Kurdî ya nûjen de zehmetiyên ku jin dijîn û pirsgirêkên bi nasnameya jinê re jî cihekî girîng digirin. Berhemên nivîskar û helbestvanên jin serpêhatî û têkoşîna jinan a di jiyana rojane de nîşan dide.
5. Cûreyên Wêjeyî: Edebiyata Kurdî ya nûjen cureyên wêjeyî yên curbicur wek helbest, roman, çîrok, şano, gotar di xwe de dihewîne. Di berhemên vê cureyê de teknîkên edebî û şêwazên vegotinê yên hevdem tên bikaranîn.

Edebiyata kurdî ya nûjen di xurtkirina nasnameya çandî, parastina ziman û vegotina serpêhatiyên kurdî de roleke girîng lîstiye. Di heman demê de, nivîskar û helbestvanên kurd bi berhemên ku di qada navneteweyî de jî tên naskirin, wêjeya kurdî bi xwendevanên berfireh dan naskirin.

Sudoku: Bersiv 39

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 3 | 9 | 7 | 1 | 5 | 8 | 2 | 6 |
| 8 | 1 | 6 | 2 | 3 | 9 | 5 | 4 | 7 |
| 7 | 5 | 2 | 4 | 6 | 8 | 1 | 3 | 9 |
| 5 | 8 | 4 | 9 | 7 | 1 | 3 | 6 | 2 |
| 6 | 7 | 1 | 3 | 5 | 2 | 4 | 9 | 8 |
| 9 | 2 | 3 | 8 | 4 | 6 | 7 | 5 | 1 |
| 2 | 6 | 5 | 1 | 8 | 4 | 9 | 7 | 3 |
| 3 | 4 | 8 | 6 | 9 | 7 | 2 | 1 | 5 |
| 1 | 9 | 7 | 5 | 2 | 3 | 6 | 8 | 4 |

Sudoku:Pirs 40

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 9 | 1 | | | 3 | | | |
| | | 3 | | | | 5 | 6 | 4 |
| 7 | | 4 | 2 | | | | 1 | |
| 1 | 7 | | | 5 | | | | |
| | 6 | | | | | | 9 | |
| | | | | 9 | | | 5 | 1 |
| | 1 | | | | 9 | 6 | | 5 |
| 4 | 8 | 5 | | | | 1 | | |
| | | | 8 | | | 7 | 4 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Em elemoyî bûn:**
- Bi heman wateyê.

**Hasil gihat Mûsil:**
- Tiştek jê nema; tev hat belavkirin; tev hat dayîn; tu dereng mayî.
(Dema tiştek tê belavkirin û hin li dawiyê tên dixwazin hingê tê gotin)

**Hathata Mîrê Bohta ye:**
- Ev demeke dirêj e em li bendê ne lê nayê.

**Hathata Mîrê Hekarî ye:**
- Bi heman wateyê.

**Heta bê wê hêstir bize:**
- Pir dereng tê; pir dereng tev digere.

**Jin biriye hê qelen nebirriye:**
- Karê destpêkê ji paş re hiştiye.

**Keçel çû pey bayê, ba hat keçel nayê:**
- Dema yek bi tiştekî ve diçe lê zû venagere, hingê jê re tê gotin.

**Kevçikê çila nû got bismilla:**
- Pir dereng ma; tişta ku diviya destpêkê bike, yan bêje pir dereng kir, yan got.

**Miriye par havînê nû hatiye şînê:**
- Pir dereng maye.

**Pêlên avê bi ser peravan ketin:**
- Êdî çênabe; êdî çareser nabe; êdî borî; dem ser re derbas bûye.

**Pîrê payîzê çû liqatê:**
- Dema mirovek ne di dema wî de dest bi karekî bike hingê tê gotin.

**Pîrê têr bû ji kîrê, dû re sêwî hatin bîrê:**
- Piştî ku her tişt qediya nû hat bîrê ku karekî ne di cî de kiriye.

**Pîra Sibatê wê nû biçe liqatê:**
- Dema yek dereng dest bi karekî dike hingê tê gotin.

**Sera pîra ye:**
- Dema wê boriye.
(Dema tiştek ne di dema wê de tê kirin, ango dema wê borîbe, hingê tê gotin)

**Sergiraniyan dike:**
- Xwe giran dike; zû naçe; zû nake; nazên xwe dike.

**Serê xwe giran dike:**
- Bi heman wateyê.

**Şana hingiv e lêbelê neşîrînkirî ye:**
- Derfetên wî hene lê nake; dikare bike lê nake; dikare bide lê nade.

**Şor kir:**
- Pir ma dereng; em pir hiştin li benda xwe.

**Tira par havînê, îro hatiye şînê:**
- Tişta borî nû li pey dikeve.

**LI SER ŞÊWRÊ**

**Aqil avêtin ser aqilan:**
- Her yekî tiştetk got; her yekî li gorî xwe çareyek anî.

**Kuma daynin pirsa jê bikin:**
- Bê mişêwiret, bê pirsa ji hina divê mirov tiştekî ne.

**Kumê xwe dayne ber xwe pê bişêwire:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Kongra Star di sala 2023`an de xebatên giranbuha dan meşandin



Kongra Star a Kantona Qamişlo praniya planên xwe yên sala 2023`an pêk anîn, Berdevka Kongra Star a Kantona Qamişlo Ibtîsam Elhisên diyar kir ku wan di nava salekê de gelek kar û xebatên giranbiha dane meşandin.R-2

## 'Guhê xwe bidin hêz, deng û heqîqeta Abdullah Ocalan'



Parlamentera Partiya Demokrasî û Wekheviya Gelan (DEM) a Şirnexê Newroz Ûysal di axaftina xwe ya li ser bûdçeya Wezareta Edaletê ya li Meclîsê de, li hember tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bertekên hişk nîşan da.**R-3**

## 'Em ê bi fikir û felsefeya Rêber Apo xwe azad bikin'

Hevserokê Encûmana Ciwanên Kurd Rodî Hesen diyar kir ku dewleta Tirk bi hemû rêbazan li dijî ciwan û civaka kurd şerê qirkirinê dide meşandin û got, li hemberî şerê taybet ku dijmin li dijî me dide meşandin, em li ser fikr û felsefeya Rêber Apo roj bi roj bexwedanî û tekoşîna xwe xurtir dikin.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1128 | 24-Berfanbar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# KOMKUJIYA PARÎSÊ YA 2`YEMÎN DEWAMA SIYASETA QIRKIRINA GELÊ KURD E

Di 23'ê Berfanbara 2022'an de, Bi armanca şikandina vîna gelê Kurd,li Parîsê li dijî Komeleya Çanda Kurd ya Ahmet Kaya êrişeke hovane hat kirin û di encamê de endama Konseya Rêveber a KCK'ê Emîne Kara (Evîn Goyî), hunermend Mîr Perwer û welatparêzê Kurd Abdulrihman Kizil şehîd bûn. Komkujiya Parîsê ya duyemîn dewamiya siyasetên qirkirina gelê kurd e, dewleta Firansa li şûna ku edaletê pêk bîne li ser kujer û hevkarên komkujiyê nixumand. Li hemberî wê jî gelê kurd asta têkoşînê blindtir kir û soza tolhildana şehîdan nû kir.**R-5**




## SZK'ê saziya parastin û pêşxistina zimanê Kurdî ye



SZK'ê ji bo parastin û pêşxistina zimanê kurdî li Rojava îsal 5 pirtûkên cuda û sûdmend weşandin, 3 bernameyên girêdayî ziman û çandî pêşkêş dike, herwiha perwerdeyên zimanê kurdî dide hezkiriyên zimanê dayîkê.**R-7**

## Bandora dorpêçê li ser Nexweşxaneya Til Rifet û nexweşên gurçikan



Nexweşxaneya Til Rifetê duyemîn nexweşxane li herêma Şehbayê ye, herî dawî jî beşa şûştina gurçikan jî li nexweşxaniyê hat zêdekirin. Rêveberiya Nexweşxaneya Til Rifetê diyar kir ku ew bi kêm derfetan hewil didin bi gel re bibin alîkar û ji ber dorpêçê gelek astengî derketin.**R-6**



Sîpan Şînda
**Planên li ser demografîya Kurdan** *R-7*



Hafiz Ahmet Turhalli
**Zimandirêjiya ser Şêx Seîd** *R-6*

# Kongra Star di sala 2023`an de xebatên giranbuha dan meşandin

Kongra Star a Kantona Qamişlo praniya planên xwe yên sala 2023`an pêk anîn, Berdevka Kongra Star a Kantona Qamişlo Ibtîsam Elhisên diyar kir ku wan di nava salekê de gelek kar û xebatên giranbiha dane meşandin.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Rêxistina jin di Rojavayê Kurdistanê de, di encama berhem û berxwedaniya bi 10`an jinên berxwedêr yên li hemberî zihniyeta baviksalarî ya ku 5 hezar sal berdewam kiriye û bû wekî bingehekî di Rojava de. Herwiha di destpêka şoreşa Rojava de jin rol û misyon xwe di hemû qadên jiyanî de girt. Berî şoreşa Rojava bi keda 100`ên jinan di riya karên leşkerî de, kar û xebat ji bo netewa kurd, rêxistinkirin û perwerdekirina jin, bi fikir û felsefeya Rêber Apo dihat meşandin. Ji xwe piştî şoreşa Rojava, ya ku bi pêşengtiya jin dest pê kir, roj bi roj gavên ber bi pêşerojeke azad û demokratîk ve hatin avêtin. Yek ji wan gavan jî ku sala 2005`an de, bi pêşengtî û kombûna jinan di bin navekî fermî de Yekîtiya Star hat avakirin, di bin vî navî de xweghandina jinan, rêxistinkirin, perwerdekirin, lidarxistina civînan, lidarxistina meşên xweser, di bin sîwana jin de hatin meşandin, di heman demê de vekirina perwerdeyên girtî û vekirî, lidarxistina civînên berfireh û serdankirina jinan di malbatan de, heta gihandina sala 2016`an de dihat kirin. Êdî di sala 2016`an de Yekîtiya Star xwe veguherand Kongra Star. Kongra Star ji Yekîtiya Star berfirehtir bû, ne tenê jinên kurd digirt nav xwe, jinên hemû pêkhateyan girt nav xwe û ji bo hemû jinan bû wekî sîwanekî rêxistinkirin, perwerdekirin û avakirina konfedralîzmeke jin bû.

### Kongra Star di sala 2023`an de kar û xebatên pîroz dan meşandin

Piştî lidarxistina konfiransa 9`mîn a Kongra Star li ser asta Kantona Qamişlo, Kongra Star kar û xebatên xwe yên Sala 2023`an da eşkerekirin. Kongra Star di riya meş, mîtîng, çalakî û lidarxistina civînan de kar û xebatên xwe dan meşandina, di asta herî jor de armanca wan ya sereke ew bû ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were, ev xala yekemîn ji pilanên Kongra Star bû. Wekî din jî li ser asta kantona Qamişlo û di hemû navçeyan de lidarxistina panêlan di bin durûşmeya 'Jin Jiyan Azadî' ya ku bi 10`ên salan li çiyayên Azad wekî felsefa Rêber Apo û bi qêrîna hezarên jinan, ev panêl hatin lidarxistin. Herwiha ji bo danasîna silogana 'Jin Jiyan Azadî' û naskirina wateya jin çiye? Ku jin ji jiyanê hatiye û jin jiyanê diafirîne, ew jiyan jî gerek



bi awayekî azad be, azadiyeke di hizir û kesayeteke afrîner, xûlqkar bi hizirekî azad biafrîne li ser vê bingehê panêl hat lidarxistin.

### Dijmin nikare serdestiya xwe li ser civakên azad bide meşandin

Kongra Star ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo konfirans li hemû bajaran li dar xistin, da ku bibe bangewaziyek ji Rêxistina CPT û rêxistinên mafê mirovan re. Li aliyekî din jî ji bo berdevkên meclisên Kongira Star li hemû navçeyên kantona Qamişlo, perwerdeyeke girtî li ser 3 rojan di derbarê Hunera Rêveberiyê hat birin, di vê perwerdeyê de, wateya rêveberiyê hat şîrovekirin, li gel wê jî li ser hevjiyana azad perwerdeyeke li ser 3 rojan hatibûn vekirin, armanca jê ew bû danasîna wetaya hevjiyana azad û avakirina jiyaneke demokratîk di navbera jin û mêr de, da ku malbatên demokratîk werin avakirin, ji ber şaneya herî biçûk di civakê de malbate û ya herî wê malbatê ava dike jine. Dema jin azad be, bê guman malbateke azad tê avakirin, di encama de civakeke azad û demokratîk tê avakirin, herwiha bi avakirina civakên azad, dijmin nikare serdestiya xwe li ser civakê bide meşandin.

### Nameyên zarokan ji Rêber Apo re bû berhemekî Kongra Star

Kongra Star ji bo naskirina fikir û ramanên Rêber Apo, di aliyên jin, dîrok, zanist û pêşerojê de, 500 pareznameyên Rêber Apo li hemû navçeyên bajarê Qamişlo di vê salê de belav kiribûn. Li gel wê jî li ser asta Kantona Qamişlo 507 name hatin nivîsandin, piraniya wan jî ji aliyê zarokan ve bû û ev name wekî berhemekî Kongra Star hat weşandin. Herwiha ji bo mekînêzmeya kar di nava komîteyên Kongra Star û Rêveberê Meclisa Kongra Star de, di heman demê de ji bo naskirin û xurtkirina mekînezmeya kar di navbera meclisên Kongra Star û hevserokên jin yên di saziyên Rêveberiya Xweser de hezar û 546 civînên rêxistinî, ji komîteyên ên Kongra Star, berdevkên saziyên Rêveberiya Xweser, bajarok û hevserokên TEV-DEM`ê re li ser asta Bakur û Rojhilata Sûriyê hatin lidarxistin.

### Îsal 18 hezar û 346 serdan ji malbatan re hatin kirin

Di heman sale de ji aliyê Kongra Star, 18 hezar û 346 serdan ji malbatên Kantona Qamişlo re hatiye kirin, armanca serdana van malbata jî, ji bo danasîna Kongra Star wekî rêxistina jin di nava civakê de, ji bo perwerdekirina malbatan li ser mijarên zewaca temen biçûk, pirzewacî û herî zêde nîqaşên li ser şerê taybet ku bi taybet jin hedef digire. Herwiha li ser mijarên tundiya li dijî jinê, azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, naskirina netewa demokratîk û naskirina gelek mijarên din, di van serdanan de hatin nîqaşkirin.

### kesên rêveber mejiyê civakê ne

Kongra Star ji bo guhertina hişmendiya zayindperest û mêrên azad bên avakirin 20 perwerdeyên li ser 3 rojan di asta Kantona Qamişlo de, bi beşdarbûna mêran û ji aliyê jin ve perwerde hatin dayîn. Herwiha ji bo pêşxistina endam û rêveberên meclisên Kongra Star perwerdeyên vekirî û girtî hatin dayîn, li ser vê bingehê 34 endam tevlî perwerdeyên vekirî bûn, 65 endam tevlî perwerdeyên girtî bûn, ji ber kesên rêveber mejiyê civakê ne û ew yên ku rê nîşanî nifşên pêşerojê dikin. Di vê salê de jî 42 daxuyanî ji bo naskirina 8`ê Adarê, Rojbûna Rêber Apo, herwiha di derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker, salvegera Şehîd Zeyneb û Yelmaz, Ji bo keça kurd Jîna Emînî, Salvegera Yadê Eqîda û Şehîd Nagîhan Akarsal û di gelek mijarên cûda cûda de hatin xwendin. Herwiha ji aliyê Kongra Star ve, 643 semîner li ser hemû gûreyên tundiya li dijî jinê bi tevlîbûna 4 hezar û 579 kesî hatin birin. Bi pêşengtiya Kongra Star 58 meşên xweser, girêdayî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, êrişên dewleta Tirk, bîranîna Şehîdan, Roja 25`ê Mijdarê û armancgirtina pêşengên civakê, li ser asta Kantona Qamişlo hatin lidarxistin.

### Her komîteyek xwedî taybetmendiyeke cûda ye

Meclisên Kongra Star li ser asta kantonê 5 rêveber û hejmarek ji komîtayan digire nava xwe, ew komîte jî evin; Komîta Perwerdê, Komîteya Edaleta jin, Komîta Parastina Cewherî ya Jin, Komîta Aborî, Komîta Tenduristiyê, Komîta Ekolojîk, Komîta Ragihandinê, Komîta Darayî, Komîta Qada Civakî û Komîta Hîlala Zêrîn. Her komîtek di derbarê kar û xebatên wê de taybetmendiyeke cûda heye.

-Girîngiya Komîteya perwerdê ew e ku wek Rêber Apo gotî perwerde an perwerde, tişa herî girîng di guherin û veguhertina zihniyeta civakên ku li ser olên tundirew û hişmendiya zayendperesî, civakeke yek alî bi hezarê salan, hatiye avakirin, encex di riya perwerdeyan de zihniya heyî bê guhertin, kevneşopî bên rakirin û zanisteke nû bê avakirin. Perwerde xwedî girîngiyeke cûda ye.

-Komîteya Edaleta jin di hundirê xwe de mala jin, di hundirê mala jin de desteyên Lihevanînê heye. kar û xebatê komîteya Edaletê parastin û pêşwazîkirina hemû kesên di civakê de û çaraserkirina pirsgirêkên wan.

-Girîngî û Rola komîta Aborî di hemû civakan de, lingê bingehîn ku ew civak karibe li ser xwe bisekine û bi pêş de here aboriye, bi taybet di aliyê jin de. Di riya aborî de jin tim dibû kole û ayidê mêr, ji bo vê yekê erkê komîta aborî xurtkirina aboriya jin, di riya kopiratîv û avakirina pirojeyan de, da ku jin bibe xwediyê aboriyeke serbixwe kar û xebatên aborî li ser vê bingehê hat meşandin.

-Komîta akolojîk lingê bingehîn ê piradîkmeya ya Rêber Apo ye. Rêber Apo dibêje civakeke demokratîk bi civakeke ekolojîk û azadiya jin re tê avakirin. li ser vê bingehê komîteya ekolojîk li jin, civak û xwezayê xwedî derdikeve, ev yek di aliyê kampaniya darçandinê di roja rojbûna Rêbertî û gelek roj in pîroz de dar tên çandin.

-komîta Qada civakî yekser aleqedarî civakê yê, di nav xwe de Weqfa Jina Azad, Ofîsa jin di ol û civakê de, Rêxistina Nûdem û Komîteyên zarokan digire. Di riya van sazî û ofîsan de, jin xwe digihînin hemû beşên civakê.

-Komîteya Hîlala Zêrîn jî ji destpêka çand û hunera kurd de û heta roja îro di riya jinê de hetiye parastina û di roja îro xwe berdewam dike. Herwiha kar û xebatên Hîlala Zêrîn bi pirengiya jinên hemû netewan tê xemlandin.

-komîteya Ragihandina jin ne tenê di asta Kantona Qamişlo di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, nirxên kolektîf ên demokratîk yên jinan bi riya têkoşîn, berxwedan, geşedanên şorşgerî yên ji bo azadiya jinê ku her roj bi riyên aktîf û perwerdehî dide nasîn û belav dike.

-komîteya darayî komîteyeke piratîkiye, kar û xebatên wê di aliyê peydakirina pêdiviyên navendan, di aliyê teknîkî, avakirin û tiştên pêwîst di hundirê navendan de ye.

-Komîteya Parastina Cewherî ya jin jî xwedî roleke bingehîn di nava civakê de ye. Rêxistina konfederal a demokratîk a jinan û têkoşîna azadiyê ya bê navber li hemberî hemû êrîşên pergala baviksalarî awayê bingehîn ê parastina cewheriye.

- Komîta Tenduristiyê ji pêşxistin û birêxistinkirina xebatên tenduristiyê yên jinan re berpirsyar e.

### Pilansaziya Kongra Star ji bo sala 2024`an

-Lidarxistina hemû cûreyên çalakiyan, herwiha meşandina kar û xebatan di hemû hêlan de, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo.
-Xwegihandina hemû jinan, di riya serdana malbatan û tevlîkirina malbatên nû.
-Xurtkirina perwerdê bi rêbazên nû, da ku encam bên girtin.
-Berdewamkirina ektîvkirina girûpên xwendinê, ji bo guhertina hişmendiya paşferû ya ku jinê tim kole dihêle.
-Ektîvkirina hevserokên jin di komînan de.
-Lidarxistina panêlan li ser rewşa jin di şoreşa Rojava da û rol wê di pêşxistina civakê û şoreşê de.
-Lidarxistina bilatforman ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo.
-Xurtkirina aboriya jin di riya koperatîf û pirojeyan de.

Di derbarê meşandina kar û xebatên kongra Star yên sala 2023`an de Berdevka Kongra Star a Kantona Qamişlo Ibtîsam Elhisên ji rojnama me re axivî.

Ibtîsam Elhesên diyar kir ku bernameyên ku wan di sala 2023`an danîbûn pêşiya xwe piraniya wê pêk hat û wiha got: "Me piraniya bernameyên xwe pêk anî. Herwiha ya girîng jî ew bû ku em xwe bighînin hemû jinan, wan rêxistin û perwerde bikin, da ku karibin xwedî li xwe derkevin, ji bin koletiyê xwe rêzgar bikin û zincîrên koletiyê beqetînin, ev jî heta astekê kêm pêk hat. Li ser vê bingehê di sala 2024`an de em ê bi hemû derfetên xwe kar û xebatên xwe bidin meşandin, da ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were û xebatên me li gorî nirxên şehîdan be."



# SZK'ê saziya parastin û pêşxistina zimanê Kurdî ye

SZK'ê ji bo parastin û pêşxistina zimanê kurdî li Rojava îsal 5 pirtûkên cuda û sûdmend weşandin, 3 bernameyên girêdayî ziman û çandî pêşkêş dike, herwiha perwerdeyên zimanê kurdî dide hezkiriyên zimanê dayîkê. Hevseroka SZK'ê, Viyan Hesen ji aliyê xwe ve anî ser ziman ku pêwîstiya zimanê kurdî bi kesên pispor heye û hêviya vê yekê jî di xwendekarên zanîngeh û hezkiriyên zimanê kurdî de heye.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Ziman ji bo mirov yek ji mercên hebûnê ne, hebûna SZK'ê ji bo hebûna gelê kurd li Rojava jî cihê hewcedariyê ye. Saziya Zimanê Kurdî (SZK), li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, saziyeke ku mijûlî hemû warên zimanî yê pêkhateya kurd dibe. Ev sazî di sala 2007'an de hatiye damezrandin.

Ji ber qedexekirina hikumeta Şamê ya li ser ziman, çand û her tevgereke rewşenbîrî û siyasî yên têkildarî gelê kurd bûn, SZK'ê jî heta 2011'an bi awayekî veşartî ji bo parastin û pêşxistina zimanê kurdî wê demê xebat dida meşandin.

Êdî bi destpêkirina Şoreşa 19'ê Tîrmehê re SZK'ê û gelê kurd ketine qonaxeke nû de, derfetên xebata ji bo pêşxistina zimanê kurdî hêsantir bû û heta roja îro xebat berdewam e. Herwiha ev sazî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gelek navend û komîtê wê hene, 40 mamosteyan û 35 xebatkaran dihewîne nav xebata xwe ya rojane.

**Berhemên ku îsal ji aliyê SZK'ê ve hatin weşandin ev in:**

1: Berhema "Rêzimana Kurmancî" ku ji hêla herdu endamên SZK'ê Ferhad Mûsa û Vîyan Hesen ve hatîye danîn, nûxurîya weşanên SZK'ê û berhema wê ya pêşîn e.

2:Dîwana "Xebat û Şîyarî" ya Mela Ehmedê Paloyî. Latînîkirin: Beşîrê Mela Newaf û Izedîn Silêman.

3:Berhema "Wata di Navbera



Semantîk û Pragmatîkê da." Daner: Şêrzad Sebrî Elî

4:Berhema "Alomorf di Zimanê Kurdî da". Daner: Zêrîn Xorşîd Selîm.

5: Berhema "Kird, Kirmanc, Dimilî yan jî Kurdên Zaza"yê ya Malmîsanijî ji nav weşanên SZKyê derket. Wergera ji zimanê tirkî bi riya Hacer Petekkaya (Xecê) û Mîlad Xezalê.

**Bernameyên ku SZK'ê bi awayîkî rojane diweşîne ev in:**

Bernameya Kilasîkên Rojhilatê, bi riya pêşkêşvan, Deham Ebdilfetah.

Bernameya Her Rojek Peyvek, bi riya pêşkêşvan, Anahîta Êlo.

Bernameya Biwêjan, bi riya pêşkêşvan Evdiselam Xoce.

Derbarê kar û xebata SZK'ê de hevseroka Saziya Zimanê Kurdî, Viyan Hesen ji rojnameya me re axivî.

### Kar û xebata SZK'ê

Viyan têkildarî kar û xebata SZK'ê wiha got: "SZK'ê 5 komîteyan digre nav qada xwe ya xebata ji bo zimanê kurdî. Weke komîteya ziman, lêkolînan di derbarê zimanê kurdî de dike û bi taybet zaravaya kurmancî. Armanca vê komîteyê amadekirina cavkaniyên zanistî û akadîmî ji qada zimanî re ye. Herwiha berhman amade dike weke van berhemên ku îsal ji weşanên SZK'ê hatin derxistin, yek ji van berheman jî berhema SZK'ê ya yekem, bi navê Rêzmana Kurmancî. Rêzmana Kurmancî pirtûkeke giranbuha ye ji bo kurdên Rojava û bi armanca sitandardbûna zaravaya kurmancî derxist. Komîteya Raghandinê an jî (SZK Mediya) heye û SZK' armanca wê ew e ku hin mijarên zimanî bi awayekî hêsan bi riya soşal mediya bighîne civakê. Di heman demê de jî bi riya 3 bernameyên xwe yên zimanî sûdekê bide civakê. Herwiha komîteya berhevkariyê jî çîrok, destan, biwêj, peyîv hwd… ji bo amadekirina berheman ji nav civakê berhev dike. Di heman demê de komîteya perwerdekirinê cihê xwe di nav SZK'ê de digre. Ev komîte mijûlî perwerdeya zimanê kurdî ji bo mamoste û xebatkaran dibe, li ser vê bingehê kar û xebatê di çarçoveya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dide meşandin. Perwerde bi zaravaya kurmancî li ser 3 astan ji bo xwendekar û mamosteyan tê dayîn. Herwiha perwerdeya zaravaya zazakî jî tê dayîn. Komîteya kargêrî jî heye û mijûlî warê erşîf, belgekirin û aborî dibe.

Viyan Hesen di derbarê kar û xebata SZK'ê de wiha domand: "Berhemên ku me îsal weşandin tev jî berî sala 2023'an kar li ser wan hatibû kirin û bûn berhemên SZK'ê yên îsal. Îsal jî kar li ser berhemên nû tê kirin, pirtûk tên berhevkirin û wê di demê pêş de werin weşandin. Ji bo bernameyên îsal jî heman tiştê, sala 2023'ê berdewamiya xebat sala 2022'yan e û xebat li ser mijarên nû tên kirin."

### Astengiyên ku derdikevin pêşiya xebata SZK'ê

Hevseroka Saziya Zimanê Kurdî, Viyan Hesen di derbarê astengiyên ku derdikevin pêşiya SZK'ê wiha anî ser ziman: "Em weke Saziya Zimanê Kurdî, ku saziyeke mijûlî xebat û lêkolînkirina li ser zimanê kurdî dibe. Carcaran Rojava di rewşên zehmet re derbas dibe, rewşa ewlehî nearam dibe û bandorê li kar û xebata me jî dike. Pirîcarna em lêkolînên zimanî ji bo berhem û bernameyên xwe di nav civakê de çêdikin dema ku êrîş tên ser herêma me, em neçar dimînin, van ger û lêkolînan rawestînin. Ev yek dibe kelem li pêşiya kar û xebata SZK'ê. Herwiha em li Rojava di peydakirina kesên bispor de ku ji bo mijûlî xebata zimanî bibin astengiyan dikşînin. Birastî li Rojava hejmara van kesên akadîmîsen yên ku di qada lêkolînan a SZK'ê de ne, kêm in. Ji bo ku zimanê me bêtir were pêşxistin û parastin pêwîstiya me gelekî bi van kesên wiha heye. Hêviya me ji hezkerên zimanê kurdî, xwendekarên me yên zanîngeh, peymangeh û yên xwendina bilind de heye ku xwe baş li pêş bixin, bi coşeke mezin tevlî xebatên zimanê kurdî û SZK'ê bibin.

# Dayê Qumrî, 45 sale teşîrîs çêdike

Dayîka Qûmrî Tunç ku li Wargeha Mexmûrê jiyan dike, ev 45 salin bi teşiyê rîs çêdike û bi wê rîsê jî gore, parzûn, şeleme û her cûre keda dest çêdike. Dayîka Qûmrî dibêje: "Ez çanda xwe dihûnim û diparêzim."

Jin û çand-huner ji hev nayê veqetandin. Ji dîrokê heta roja me ya îro avaker û parastvana çand û hunera civakê, jin e. Ne tenê di civaka Kurd de, di tevahî cîhanê de jin xwedî li çand, huner û civaka xwe derketiye.

Jinên Kurd ku bi girêdana xwe ya bi huner û çandê re tê nasîn, timî bi keda destê xwe zilm, êşên kişandî û xweşiktiya jina Kurd jiyan kirî vehûnandiye. Jinên Kurd ev sedan sale bi hirya pez rîs çêkirine û bi wê rîsê jî gore, parzûn, lîf, şeleme, têr, mehfûr, werîs, doxîn û her cûre keda dest çêkirine. Civaka Kurd bi keda destê jinan xwe daye jiyankirin. Heta roja me ya îro jî çand û hunera çêkirina teşîrîs di nava jinên Kurd de heye.

Dayîka Qûmrî Tunç ku li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) jiyan dike, ev zêdeyî 45 salane teşîrîs çêdike û bi wê yekî xwedî li çanda xwe derdikeve.

### Ji dayîka xwe fêr bûye

Dayîka Qûmrî di destpêka axaftinên xwe de tîne ziman ku ew hîn di zarokatiya xwe de fêrî çêkirina teşîrîs bûye û got: "Ev kar karekî hunerî ye û em ji pêşiyên xwe ango dayîkên xwe fêr bûne. Çanda me ye û emê wê çandê bidin jiyankirin. Ev 45 salin, ez vî karê dikim û ezê bidim berdewamkirin."

Qûmrî Tunç di nava axaftinên xwe de da zanîn ku jinên Kurd ji hirî, rîs çêdike û ji wê rîsê jî gore, parzûn, lîf, şeleme, têr, doxîn, werîs, mehfûr û her weke din çêdikin. Her wiha diyar kir ku ew dest ji çanda xwe bernade û niha jî li Wargeha Mexmûrê çanda xwe dide berdewamkirin. Dayîka Qûmrî destnîşan dike ku jinên Kurd berê ji bo ku rîsên reng bi reng bidest bixin ji xwezayê sud digirtin, ango bi gul, qalikên gûzan û her cûre şînatiyan rîs çêdikirin. Bi vê yekî carek din girêdana jinên Kurd bi xwezayê re diyar dibe. Dayîka Qûmrî wiha behsa peydakirina wan rengan dike: "Rîs bi xwe spî ye, lê ji bo ku em rengên cûda peyda bikin, me ji xwezayê alîkarî digirt. Me bi qalikên gûzan ango jêre dibêjin rizgoz, dikelandin û rengê reş peyda dikir.



Me kîjan reng dixwest, me ji xwezayê digirt û bi kelandina wan berheman reng derdixist holê."

### 'Xwezî li zehmetiya berê, ne rehetiya niha'

Dayîka Qûmrî çêkirina teşîrîsê wek destpêka hunerê binav dike û dibêje ku berhemên berê ji yên niha ango ji yên pergalê bi tenduristirin. Her wiha bal dikêşe li ser zehmetiyên çêkirina teşîrîsê û wiha pê de diçe: "Berhemên niha yên dikanan, hemû ji tenduristiyê re ne başin. Ji ber ku plastîk di nav de hene, lê di nava rîs de nînin. Raste niha hertişt hêsan bûye, lê kêfxweşî û ked nemaye. Berê zehmetî hebûn, li kêleka wan zehmetiyan jî kêfxweşî hebûn. Niha ked nîne, her kes fêrî betaliyê bûne û ji bo wê niha rêjeya nexweşiyan zêde ne."

Herî dawî Dayîka Qûmrî Tunç destnîşan kir ku eleqederiya ji teşîrîsê re kêm bûye û tenê kesên nimêj dikin carnan ji xwe re goreyên rîs çêdikin, li ser wê bang li ciwanan dike ku xwedî li çanda Kurdewarî derbikevin.

## Planên li ser demografîya Kurdan



**Sîpan Şînda**

Her çend di demê Osmanîyan de jî Kurd di bin zilm û pêstûrîyê de bûn, lê belê piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, Kurd bi awayekî sîstematîk ketin di bin pêstûrî, bişavtin û qirkirina çar dewletên ku Kurdistan dagirkirine de. Ji ber ku ev her çar dewlet jî dizanine ku ew li ser welatê Kurdan bi cih bûne, her û her tirsa desthilatdariya wan ya li ser Kurdistanê ji destê wan biçe di zikê wan de weke kurmekî hinavê wan dixwe. Ji ber wê, ew jî eve sed sal in çi hêz û quweta bi wan re heyî, çi fen û fîtên bi wan re heyî hemî li himberî Kurdan şixwilandine da ku wan bi qelînine. Lê xêr ji Xwidê, heta niha ji nekarîne Kurdan ji qada dîrokê rakine. Belê gelek qetlîam li serê wan de anîn, ziman û çanda Kurdan qetil kirin û dizîn, malên wan talan kirin, lê dîsa jî nekarîn Kurdan xilas bikine. Ev sed sal in, bi sedan caran planên xef çêkirin ka wê çawa Kurdan ji bi giştî qir bikine. Yek ji van planên herî bi tehlûke jê plansaziya şênîyan e. Ango plansazîya malbatê ye. Bi taybetî jî dewleta Tirk di vî warî de gelek serê xwe êşandî ye gelek plan li ser Kurdan çêkirine ka wê çawa bi awayekî sîstematîk jimara Kurdan bi destê Kurdan bide kêmkirin. Mixabin li Bakûrê Kurdistanê di vî warî de hema bêje serketîne û gelek Kurd bi vê lehîstûka wan xapane.

Jixwe her çar dewlet jî, her yekê di alîyê xwe de geh Kurdan qetil dikin, geh cih û warên wan xirab dikin û wan penaber dikin, geh wan sergum dikine. Çar dewletên neyar ne bes bûn, îca niha hinek Kurd jî li ser navê "modernîzmê" tevilî vî karwanî bûne û piştgirîya planên neyarên Kurdan yên li ser guhertina demografîya Kurdan li Kurdistanê dikine. Neyarên Kurdan, ev bi sedan salane vê dikine. Geh Kurd sergunî Anatoliya navîn kirin, geh sergunî Girîtê kirin, geh sergunî Xorasanê kirin, geh sergunî Qefqas û Balkana kirin. Îro jî berê sed hazaran Kurd didine Ewropa û li Rojava û li Kerkûkê heman tiştê dikine û demografîya erdnîgarîya Kurdistanê diguherîne. Lê divê îca Kurd li hemberî vê plana neyaran hişyar bibine û li gorî wê tevbigerine. Yek, divê Kurd li herçar parçên Kurdistanê û li Ewropa zarokan zêde çêkine û wan baş perwerde bikine. Bi taybetî jî li Bakûrê Kurdistanê, divê Kurd di vî warî de gavên girîng bavêjine û planên demdirêj çêkine. Da ku bikaribin li Bakûr û Tirkiyê jimara şênîyên Kurd zêde bikin û di sîyaseta Tirkiyê de bibin xwedî gotin. Dudu, çi Kurdê ku bizewice divê herî kêm pênç zarokan çêke. Da ku heta 2050 yê li bakûr bikaribin di warê polîtîk de xwedî gotin bin û di meclîsê de bikaribin tişta bixwazin bi dest xwe ve bînin. Nexwe bi vî hawî wê heta 2050 yê jimara Kurdan gelek bê qîmet bibe. Jixwe tu sergunkirina Ewropa û bişaftina çandî û zimanî ji lê bikî hema bêje wê Kurd li Bakûr nemînin. Sê, divê xwendayên Kurdan jî di vî warî de mentalîta xwe biguherîne û li hemberî bişaftina ziman, çand û li ser mejîyê zarokên Kurdan ya ji alîyê dagirkeran ve tê kirin bisekinine. Divê wê tirsa "wê min ji kar bavêjine" ji ser xwe bavêjine û xwedî li nirxên xwe yên netewî derbikevine. Ev peywireke exlaqî û etîkî ye li ser her Kurdî.

Di Kurdî de dibêjine maka hezar gotinan gotineke. Ango divê Kurd jî êdî ji xwe re planan çêkine da ku bikaribin li ser vê dinê hebûna xwe bidine dûmandin.

# Navenda Çav a Rapirsînê, zimanê derbirîna gel e

Navenda Çav a Rapirsînê, yekem navenda rapisînê ku li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di 15'ê Tîrmehê de hate damezrandin. Rêveberê navendê, Silêman Iliyas destnîşan kir ku armanca Navenda Çav a Rapirsînê ew e ku raya gel di derbarê mijarên girîng de bi awayekî fermî diyar bike.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Navenda Çav a Rapirsînê navedeke ku têkildarî mijara çavdêrî û girtina nerîna raya giştî a derbarê diyardeyên girîng û hemû mijarên balkêş, xebatê dide meşandin.

Ev navend bi tevkariya Navenda Firat a Lêkolînan di 15'ê Tîrmehê de li bajarê Qamişlo hate damezrandin. Navenda Çav a Rapirsînê weke yekem tecrûbeyeke wisa ye, ku bi fermî hatiye damezrandin. Herwiha di çarçoveya kar û xebatê de niha bûye navendeke serbixwe.

Ev navend ji 7 beşan pêk tê weke; beşa pilankirin û amadekirina pirojeyan, komkirin û lêhûrbûna agahiyan, beşa meydanî, erşîv û belgekirin, edîtorî û weşandin û hwd…Zimanê weşanê yê Navenda Çav a Rapirsînê jî bi kurdî û erebî ye, li gorî ku rêveberê navendê anî ser ziman, herwiha hewildan hene ku zimanê Inglîzî tevlî zimanê weşanê bibe.

Her beşek ji van beşan jî xwedî erkeke cuda ye û ji bo beşên din temamkera karê rapirsînê ye. Hejmara endamên Navenda Çav a Rapirsînê 10 in û li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xebata rapirsînê dikin.

Girêdayî avabûna vê navendê, herwiha



kar û xebata wê, rêveberê wê Silêman Iliyas ji Rojnameya me re axivî.

**'Armanca Navenda Çav a Rapirsînê, diyarkirina raya gel e'**

Silêman Iliyas diyar kir ku armanc ji damezrandina Navenda Çav, diyarkirina raya gel a di derbarê mijareke girîng de ye û wiha got: "Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hin rojev, mijarên weke koçberî, Rêveberiya Xweser, komîn aliyê xizmetguzarî û hwd… hene. Navenda Çav a Rapirsînê jî weke navendeke fermî ji bo lêkolînkirina derbarê mijarên wiha de çêdike û nêrîna civakê digre û ji raya giştî re belav dike. Gelek mijarên civakî û birêvebirinê yên din û biryarên ku tên girtin ji aliyê Rêveberiya Xweser jî hene ku pêwîstî bi nêrîna gel heye. Rêveberiya Xweser heya asteke baş guhdara civakê ye û nêrîna gel distîne, lê dîsa em bi hewcedarî naveneke fermî ya ji bo rapirsînê bûn. Armanca me ji damezrandina Navenda Çav a Rapirsînê jî diyarkirina raya gel di derbarê mijareke taybet e. Destpêkê raya giştî di derbarê mijarekê bi riya raprsîneke berfireh tê çêkirin û ev jî beşê meydanî li ser disekine. Herwiha ev rapirsîn komî hev dibe û berdestî aliyê têkildar dibe."

**'Xebata rapirsînê, li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye'**

Iliyas anî ser ziman ku xebata Navnda Çav a Rapirsînê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye û wiha domand: "Navenda Çav a Rapirsînê berî 5 mehan hate damezrandin, destpêkê me xwe perwerde kir, êdî hin bi hin bisporiyek hat çêkirin. Me ji bo fêrbûna rapirsînê bêtirî 2 mehan perwerde li navendê da xebatkarên xwe, me li ser şêweyê çêkirina rapirsînan gelekî şopand û xebat kir. Me xwe fêrî pirsnivîsîna ji bo rapirsînê û awayê çêkirina pirsiyariyê kir. Herwiha me weke tecurbe 4 pirojeyên rapirsînê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêkirin, yek ji van rapirsînan li ser mijara koçberî, kok û bingeha komînê û hwd… Navenda Çav niha tenê li Qamişlo heye, lê dikarîbû li gor derfetên kêm kar û xebata rapirsînê, li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike. "

**astengî**

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînê, Silêman Iliyas da zanîn ku hin astengî derdikevin pêşiya xebata rapirsînê û yek ji wan jî êrîşên dagirkeriya Tirkiyê ye û wiha bi dawî kir: "Herî zêde astengiyên rêxistinî derdikevin pêşaiya Navenda Çav a Rapirsînê. Ji ber ku navenda me tenê li Qamişlo heye û xebata ku em dikin li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, êdî pêvajoya rapirsînê ji bo me zehmet e. Heta ku em xwe dighînin herêm û kantonên din û bi erkê radibin, ji bo çûn û hatinê pir zehmet e. Em niha hewl didin ku endman li tevahiya herêmên Rêveberiya Xweser bi cih bikin, ev jî pilanên dema pêş in. Li aliyekî din jî berdewamiya êrîşên dagirkeriya Tirk li ser herêmên me, bandorê li kar û xebata me dike. Di heman demê de jî em weke navendeke ku nû hatiye damezrandin astengiyan di aliyê aborî de jî dikşînin. Yek ji sedemên astengiyên aborî jî êrîşên dagirkeriya Tirkî yên ku binesaziya Rêveberiya Xweser kirin hedef, bû ku bandor li hemû aliyê civakî û rêxistinî yên saziyan kir. "

## Zimandirêjiya ser Şêx Seîd



Hafiz Ahmet Turhalli

Ev demeke zimandirêjî bi cureyekî êşkere li şehîdê kal Şeyx Seîd tê kirin.

Dijê wî gotinên pir kîret, ji devên Kemalîst û Turanîstan tên verişandin.

Divê neyê jibîrkirin evjî leystikekî Osmanî û Kemalîstane.

Lewra di hilbijartinan de Kurdan bera hevdu bidin û di navberêde, ji hilbijartinên heremî sudê wergirin.

Ev projeya ku neha berbiçav dikin û guftugoyan ser pêşdixin, di dema Partiya HDP'ê de hatiye plansazkirin, ji ber ku li ser şaredariyên HDP'ê qeyum hatin bicîhkirin û ev projeya han jî, nehatibî cîbicîkirin.

Gelo çi bû, çi qewimî binişkeve ev proje carekî din hate vegotin?

Gelo AKP û MHP'yî yên ku, nêviyê Şêx Seîdê kal bi çekên kîmyewî dişewitînin, bajarên wan wêran dikin, ser erd û bin erdê welatê wan talan dikin, hestiyên neviyê Şêx Seîd di qutîkan de radestî malbatên wan dikin, dê çawa navê Şêx li bulwaran bikin?

Ev leystikekî kîrete: Ka em bipirsin, kanî mezelê Şeyx Seîdê kal, Seyît Riza û Seîdê Kurdî?

Ma hêzên ku nêvîyên Şeyx Seîd, di fermanan derbas dikin, wê çawa navê Şêx Seîd li rêkan bikin?

Kesê di zêviya qatilên Şêx Seîd de hatine çinandin, wê çawa li Şêx Seîd xwedî derkevin?

Divê neyê jibîrkirin, ev leyistikên han pir aline. Aliyekî xwe ji bo Kurdên bê hişin, anjî Kurdên hizra wan kêm, ger ev plan biserkeve, dê bibe qezencekî ji bo hilbijartina Şaredariyan.

Aliyekî ji bo Kurdên neha di Koşk û Qesrên wan de roniştîne û xulamiya wan dikin, henekî ji wanan kirin parlementer ku berêjî, nehajî telîmat û emrên xwe ji Qatilên gelê xwe digrin.

Ewên ku dema desthelata Kemalîstên sorde, bi deh hezaran Kurd kuştin, di bin xaniyên xwe de cendekê wan veşartin, ser wan bedenên bin ax kirîde, sofreyên xwe danîn û xwarin xwarin, ji bo ew xwe binavê Şêx Seîd bişon û millete me bi xapînin ev rojev hate hunandin.

Qatilên nêviyên Şêx Seîd, neha binavê HUDA-PAR'ê dixwazin bêjin em şopdarên Şêx Seîd in.

Bi van guftogoyan dixwazin, Doza Şeyx Seîd wek dozekî Olî ku, tu eleqeyekî wê bi doza Kurd û Kurdîstanê ve tunnebe, were bicîhkirin û ev guftugo bikeve bin xizmeta senteza Îslama Tirk. Ev tişt eşkere tê dîtin. Guftugo li ser Şêx Seîdê kal tê kirin, lê hêlekî kemalîstên sor ji wê sud wergirin, hêla dîtir jî kemalîstên kesk, sudê wergrin.

Ji bo Şêx Seîd û Kurdan jî, şêlokirina doza wan pêşkeve û doza Kurdîstanê ji binîve were tunne kirin.

Derewçîyên HUDA-PARM'ê ku li gor demê geh hevkarên kemalîzma sorin, geh jî yên keskanin, behsa Şêx Seîd dikin.

Ger van qatilan bi rastî tewbe bikirana û ber bi Xweda û millete xwe bihatana, diviya deh qatê mîtîngên hevkariya Flîstîniyan, ji bo Şêx Seîd miting lidar xistibana.

Şêx Seîd, Seyît Riza, Şêx Ehmed Berzencî, Qadî Mihemed û hemû Şehîdên me nirxên me ne û divê Kurdên dilsoz, misilmanên rast, welatparêzên bi rumet li nirxên xwe xwedî derkevin û nehêlin nirxên wan bi tu awahî werin bikar anîn.

Kurdo hişyarbe; ji bo hemû xayin û neyarên Kurdan tenê rêkek maye, ew jî têkçun.

Zehf nema ew ê bi hemû hevkarên xwe re têk biçin. Tekoşînê bilind bikin, serkeftin ya nêvîyên Şêx Seîdan e.

# Bandora dorpêçê li ser Nexweşxaneya Til Rifet û nexweşên gurçikan

**Zana Roj/ Şehba**

**Nexweşxaneya Til Rifetê duyemîn nexweşxane li herêma Şehbayê ye, herî dawî jî beşa şûştina gurçikan jî li nexweşxaniyê hat zêdekirin. Rêveberiya Nexweşxaneya Til Rifetê diyar kir ku ew bi kêm derfetan hewil didin bi gel re bibin alîkar û ji ber dorpêçê gelek astengî derketin.**

Nexweşxaneya Til Rifetê yek ji nexweşxaneyên kevin yên li herêma Şehbayê ye. Piştî rizgarkirina herêma Şehbayê ji aliyê hêzên YPG û YPJ'ê ve di 2016'an de, bi derbasbûna gelê Efrînê ji herêmê re, careke din bi awayekekî lezgîn ev nexweşxane hat vekirin û aktîv kirin. Bi kêm derfetan û di zehmetiyên kêmbûna kadroyên tenduristiyê de nexweşxane kete xizmeta gelê Efrîn û yên herêmê de. Nexweşxaneya Til Rifetê bûye cihê xizmetê ji gelek gundên navçeya Şêrawa, Dêr Cimêl û navenda Til rifetê re. Weke nexwşxaneya tekena li wan deveran tê xepitandin. Dorpêça Hikumeta Şamê bandora xwe li ser tavahî qadên tenduristiyê bi gelemperî kir. Bê guman nexweşxaneya ku rojê bi sedan gel berê xwe dide wê bi awayekî neyînî bandora dorpêçê lê hat kirin. Herî dawî navenda şûştina gurçikan jî girêdayî nexweşxaneya Til Rifetê hat kirin, da bi lênêrîneke herî baş di nexweşxaneyê de li nexweşan were nêrandin.

Têkildarî nexweşxaneya Til Rifetê û beşa şûştina gurçikan, her wiha bandora dorpêça hikumeta Şamê li ser wan,yek ji rêveberiyên nexweşxaneyê Tolîn Mihemed her wiha berpirsê beşa şûştina gurçikan Hisên Mistefa ji rojnameya me re axivîn.



Tolîn Mihemed

**Di rewşeke awerte de nexweşxane hat aktîvkirin**

Tolîn bal kişand ser destpêka vekirina nexweşxaneya Til Rifetê û wiha got: "Piştî derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re û ji ber rewşa awerte ya ku gel tê re derbas bûye û koçberî herêmên Şehbayê bûne, pêwîstî bi vekirina nexweşxaneyê bi awayê herî lezgîn hat dîtin. Weke ku dihat zanîn kadroyên tenduristiyê gelek kêm bûn, her wiha alav û pêdiviyên pêwîst yên nexweşxaneyê pir kêm bûn, her wiha derbaskirina wê ji herêmê re gelek zehmet bû. Lê belê bi îsrareke mezin û bi derfetên herî kêm nexweşxane aktîv bû û ket xizmeta gel."

**Beşên nexweşxaneya Til Rifetê**

Tolîn beşên ku di nexweşxaneyê de hene anî ziman û wiha domand: "Di nexweşxane de hemû beş hatine vekirin. Beşên heyî jî ev in; lênêrîna giran, ambolans, ameliyat, beşa zarokan û her wiha 7 beşên lênêrînên cuda hene. Em hewil didin ku ji 7'an bikin 10 weke beşa dil, çav û neurologist ku em bikaribin bi gelê durî nexweşxaneya Avrîn re bibin alîkar. Her wiha dermanxaneya



Hisên Mistefa

girêdayî nexweşxaneyê jî heye. Ev hemû beş bi awayekî bê pere dikevin xizmeta gelên herêmê. herî dawî ji bo ku em bi nexweşên ku gurşikan dişon re bibin alîkar, navenda gurçik şûştinê derbasî nexweşxaneyê bû."

**`Dorpêç sûceke derheqê mirovahiyê de ye`**

Tolîn diyar kir ku dorpêça Hikumeta Şamê rê li ber tengasî û azarên gelek mezin di aliyê tenduristê de vekir û wiha got: "Hikumeta Şamê ji destpêka derbasbûna gelê Efrînê ji vê herêmê re her xwestiye zehmetiyên jiyanî bi riya ferzkirina ambargoyê dibe avakirin. di encama tunebûna sotemeniyê de em di zehmetiyên cidî re derbas dibin. Bi taybet gel dibe qurbaniyê herî sereke. Ji bo nexweşek xwe bigihîne nexweşxaneya Avrîn pereyekî pir zêde divê bide. Di hin bûyeran de nexweş gihîştin asta ku jiyana xwe ji dest bidin; ji ber tunebûna sotemenî û tevgera çûn û hatinê. Her wiha tunebûna derman di giştî herêmê de bi ser xwe sûceke derheqê mirovahiyê de. Lê dîsa jî bi derfetên heyî em hewil didin bi moralekî xweş gel pêşwazî bikin û bibin hêza çareseriyê."

**Di giştî Şehbayê de tenê yek navend ya nexweşên şûştina gurçikan heye**

Berpirsê beşa şûştina gurçikan Hisên da zanîn ku nexweşiya gurçik şûştinê gelek hesas e û dorpêça Hikumeta Şamê dibe sedema ev nexweş jiyana xwe ji dest bidin û wiha pê de çû: "Di giştî herêma Şehbayê de tenê yek navend ya nexweşên şûştina gurçikan heye. Di vê navendê de tenê tu cîhaz hene û 13 nexweş berê xwe ddin vê navendê. Ev nexweşî weke ku tê zanîn nexweşiyeke herî hesas û divê di dema wê de bê şûştin. Hin dermanên taybet yên vê nexweşiyê hene divê bên bikar anîn. Hin derman em didin wan û hin cure hene divê nexweş bikire. Lê belê derman ji % 100 hatiye buha kirin; ew jî ger were peyda kirin".

Hisên bi van peyvan bandora dorpêçê li ser nexweşan anî ziman: "Ji giştî herêmê re tenê ev navend heye. Lê hejmara nexweşên ku gurçikan dişon ji 13 kesan zêdetire. Li gorî derfetên destê me de em tenê dikarin van pêşwazî bikin. Ji ber hin kes hene nikarin derbasî Helebê bibin û hin jî hene gelek rewşa wan ya aborî nebaşe. Hikumeta Şamê di derbaskirina wan dermanên taybet de zehmetiyan derdixe. Her wiha ji bo ew cîhaz were bikaranîn pêwîstî bi kehrebê heye. Weke ku tê xswestin kehrebe nayê pêketin. Ev hemû jî ji ber siyaseta dorpêçê û tunebûna sotemeniyê ye. Di encam de yê ku temenê vê yekê dide nexweş bi xwe ye".



# 'Guhê xwe bidin hêz, deng û heqîqeta Abdullah Ocalan'

Parlamentera Partiya Demokrasî û Wekheviya Gelan (DEM) a Şirnexê Newroz Ûysal di axaftina xwe ya li ser bûdçeya Wezareta Edaletê ya li Meclîsê de, li hember tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bertekên hişk nîşan da.

**Navenda nûçeyan**

Newroz Ûysal di axaftina xwe de bi bîr xist ku tecrîda li ser Abdullah Ocalan ê 25 sal in li Girava Îmraliyê ya Tirkiyeyê girtî ye, her ku diçe kûrtir dibe.

Newroz Uysal "Polîtîkayên Îmraliyê yên Netewî" nirxand û destnîşan kir ku hikûmetê bi van polîtîkayan rê nade ku rastiya çareseriya Abdullah Ocalan bigihêje civakê.

Newroz Ûysal, destnîşan kir ku tecrîda li Îmraliyê çavkaniya bêhiqûqiya li Tirkiyeyê ye û diyar kir ku ev 25 sal in ev rewş didome û her ku diçe kêmasiya ragihandinê kûrtir dibe.

Newroz Ûysal teblîxkirina li gel parêzaran cezayên displînê û biryarên qedexekirinê yên ji bo Abdullah Ocalan rexne kir û diyar kir ku biryara tedbîrê ya Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ya di 6'ê Îlona 2022'an de ji aliyê Tirkiyeyê ve nehatiye sepandin.

Newroz Ûysal di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku fikrên Abdullah Ocalan bi çalakiyên ku li gelek welatên cîhanê tên li-



darxistin hatin nîqaşkirin û hembêz kirin û diyar kir ku divê Tirkiye vê rastiyê paşguh neke.

Newroz Ûysal herwiha ji bo demokratîkbûn, aşitî û azadiya li Tirkiyeyê banga rakirina tecrîdê kir.

Newroz Ûysal di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd a Tirkiyeyê divê ji bo azadiya Abdullah Ocalan em denge xwe bilind bikin.

Newroz Ûysal wisa axivî: "Parlementerên rêzdar, siyaseta ku Tirkiyê xizan dike, civakê ji hev vediqetîne û dike dijminê hev bidin aliyekî û bi hêz, deng û heqîqeta Abudullah Ocalan re rûbirû bimînin ku dibêje "Ez dikarim di hefteyekê de îhtîmala aştiyê çareser bikim." Divê şert û mercên tecrîda mutleq ku sûcê mirovahiyê ye, ji holê bê rakirin û her kes ji me ne tenê tecrîda li ser Abdullah Ocalan berpirsiyariya azadiya Abdullah Ocalan, bigire ser milê xwe. Niha li welatekî ku em nikarin navê wî jî bêjin Abdullah Ocalan tê nîqaşkirin, Abdullah Ocalan tê axaftin, xwedî li hizr û ramanên Abdullah Ocalan tê derketin. Em jî li vir dibêjin ku, ji bo çareseriya rasteqîn, ji bo pêşerojeke hevpar a rast, ne bêhiqûqiyê guhê xwe bidin azadiya Abdullah Ocalan hizr û ramanên wî û tecrîda mutleq biqedînin."

Herwiha girêdayî vê yekê Girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Kiriklar a Bûcayê gotin, "Heta ku Abdullah Ocalan azad nebe, em her cûre çalakiyan rewa dibînin.

Greva birçîbûnê ya dorveger a girtiyên siyasî ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27'ê Mijdarê de destpê kir, dewam dike. Girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Girtî ya bi Hejmara 2'emîn a Kiriklar a Bûcayê bi rêya parêzerên xwe peyamek şandin.

**Banga mezinkirina çalakiyan li gel hate kirin**

Peyama girtiyan bi vî rengî ye:



"Beriya her tiştî weke girtiyên azad em hemû welatparêz, aştîxwaz, demokrat û parêzvanên mafên mirovan ji dil silav dikin. Weke 32 girtiyên siyasî yên li Girtîgeha bi Hejmara 2'emîn a Kiriklar a Bûcayê, bi coş û moraleke mezin em tevlî kampanya 'Azadî ji Abudullah Ocalan re, çareseriya siyasî ji pirsgirêka Kurd re' bûn. Bi biryardariyeke mezin em çalakiya xwe ya greva birçîbûnê dewam dikin. Dost û dijmin dizanin ku Birêz Abdullah Ocalan ji bo me di ser her tiştî re ye. Li Tirkiye û Rojhilata Navîn garantiya aştî, azadî û demokrasiyê Abdullah Ocalan e. Her kes baş zane ku Birêz Ocalan muxatabê çareseriya pirsgirêka Kurd e. Ji bo azadî û hebûna Abdullah Ocalan em amade ne ku her cûre çalakiyan bikin, bi her awayî berpirsyariyê bi cih bînin. Vê gavê hefteyê du hevalên me bi dorveger tevlî greva birçîbûnê dibin. Em ji rayedarên dewletê û hevkarên wan ên li cîhanê re dibêjin; heta ku Abdullah Ocalan azad nebe her cûre çalakî ji bo me rewa ye. Û em amade ne bi her awayî fedakariyê bikin. Em zanin ku dilê malbatên me û gelê me bi me re ye û ji dil û can piştgiriyê didin çalakiya me. Her wiha em careke din bang li gelê xwe dikin; piştgiriya xwe ya ji bo me hîn mezin bikin, bi çalakiyên cihêreng azadiya Abdullah Ocalan û Kurdistanê hîn nêz bikin."

# 'Hevpeymana Civakî tekezkirina vîna gelên Sûriyê ye'

**Siyasetmedar û Rewşenbîr: Ev hevpeyman dê li ser rêya lihevhatinan ne tenê di navbera gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de di nav hemû gelê Sûriyê bibe destpêka pêngava yekem.**

Hevpeymana civakî mîna qonaxekê ku piştî çeteyên DAÎŞ'ê ji herêmê hat paqijkirin, her çawa ku qonaxeke bi ewle û lihevhatî dixwaze ava bike, ev hemû lihevhatin di navbera hemû pêkhateyên herêmê de, Kurd, Ereb, Misilman, Xiristiyan, Êzidî, Suryanî, Keldanî û Aşûrî tê dîtin.

Di vê çarçoveyê de, nûnera Meclîsa Sûriya Demokratîk Leyla Mûsa a li Misirê ji ANF'ê re axivî û wiha got: "Di derbarê ji nû ve destpêkirina civînên Komîteya Destûrî de lihevkirin nîne. Ji ber vê yekê hevpeymaneke civakî bi hewl û îradeya gelê Sûriyê bê destwerdaneke derve û bê îrade û ji hundirê Sûriyê hatiye tacîdarkirin. Ev bi serê xwe destkefta herî mezin a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Derxistina vê hevpeymana civakî piştrast dike ku gelê Sûriyê xwedî îrade û biryar in, bi îradeya xwe hevpeymana xwe ya civakî pêk tînin û ji bo birêvebirina herêmên xwe ku dûrî her ferman û destwerdaneke derve be kar dikin. Ev hevpeyman dikare ji bo Sûriyeya paşerojê bibe modelek û





li herêmên mayî jî were belavkirin. Hevpeymana civakî hêza xwe jê distîne. Ev hevpeyman dê li ser rêya lihevhatinan ne tenê di navbera gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de di nav hemû gelê Sûriyê bibe destpêka pêngava yekem."

Di heman demê de lêkolînerê siyasî yê Misirê Hanî El-Gemal jî diyar kir ku ragihandina Hevpeymana Civakî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo berfirehkirina bandora xwe li ser vê erdnîgariyê, gaveke girîng e. Hanî El-Gemal wiha got: "Cihê ku ji bo parastinê têdikoşe, rûbirûbûna rejîma Sûriyê û piştre jî komên terorîst, bi taybetî çeteyên DAÎŞ'ê, ku min li dijî wê ji bo parastina mîrata mirovî ya vê herêmê şer kir. guhertina navê Rêveberiya Xweser li ser navê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê piştrast dike ku ev mijar li heft bajarên girêdayî wê rêveberiyê yên cuda, bi awayekî yekgirtî ye. Lê rêveberiyê piştrast kir ku ew ê ne di rewşeke cudabûna tam ji Komara Sûriyê de be, lê ew pergaleke federalî yan konfederal li gor hevpeymanê ava dike. Rêveberiya Xweser di vê çarçoveyê de dibe ku ji ezmûna Iraqê yan jî ezmûna federalîzmê li Swîsreyê werbigire.

Di gelek xalên hevpeymana civakî de tekezî li ser mafên jinan, parastin û wekheviya zayendî hatiye kirin û em di nav malbata demokratîk de xwedî îradeyeke azad. Ev mijar di encama fikrên Rêber Abdullah Ocalan û balkişandina wî ya li ser piştgirî û rêzgirtina ji statû û mafên jinan pêk tê û di biryargirtin û avakirina jiyana siyasî de hevparê rast e."

# Konferansa Meclisa Jin a Îslama Demokratîk

**Konferansa damezrîner a 1'emîn a Meclisa Jin a Kongreya Îslama Demokratîk bi hilbijartina koordînasyonê û encamnameyan bi dawî bû; ji wan piştgiriya pêngava ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan, sekna li dijî nijadperestiya olî, têkbirina xîtabata nefretê û zihniyeta baviksalariyê bi rêya belavkirina fikir û têgeha îslama demokratîk.**



Di konferansa damezrîner a 1'emîn a Meclisa Jin a Kongreya Îslama Demokratîk de gelek mijarên giring hatin gotûbêjkirin, di serî de xwendina rêziknameyê û nîqaşkirina wê di konfiransê de hate kirin.

Herwiha di konfiransê de kordînasyona meclisê hate hilbijartin û 7 endamên jin ku nûnerên 7 kantonên li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bikin hatin hilbijartin; Besîra Xelîl, Delal Xelîl, Emîra El Ezo, Avîn El Hecî, Rîm Idrîs, Nesrîn Îbrahîm û Xilod Ebdo û encamname jî hate xwendin.

Xebitîna li ser damezrandina akademiya taybet bi Meclisa Jin a Kongreya Îslama Demokratîk ku kadroyên jin di dewreyên fikrî, zanistî û olî de perwerde bikin, da ku rola jinê ya olî û civakî were xurtkirin.

Herwiha ji bona xurtkirina ragihandina meclisê bi rêya danîna planên ragihandinê yên demdirêj ku tê de bername li ser dozên jinan di ol û civakê de hebin hatin danîn.

Têkiliyên li ser asta herêmê û cîhanê bi rêya pevguherîna serdan û lidarxistina panêlan bi rêya dezgehên civakî werin firehkirin.

Xebat li ser amadekirina dewreyên perwerdê yên girtî û vekirî bê kirin.

Berdewamkirina lêkolînên taybet li ser axaftinên lawaz û çêkirî yên der barê jinan de û komkirina wan di pirtûkeke taybet de.

Birêxistinkirina xebata meclisa jin li herêmên nehatine birêxistinkirin û zêdekirina endaman li gorî pêwîstiyan.

Divê rola jinê di komîteya fetweyê û îctîhadê ya nava Kongreya Îslama Demokratîk de were xurtkirin.

# ‘Em ê bi fikir û felsefeya Rêber Apo xwe azad bikin’

Hevserokê Encûmana Ciwanên Kurd Rodî Hesen diyar kir ku dewleta Tirk bi hemû rêbazan li dijî ciwan û civaka kurd şerê qirkirinê dide meşandin û got, li hemberî şerê taybet ku dijmin li dijî me dide meşandin, em li ser fikr û felsefeya Rêber Apo roj bi roj bexwedanî û tekoşîna xwe xurtir dikin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şerê taybet bi gelek navan tê naskirin (şerê psîkolojîk, şerê sar, şerê nerm, şûştina mêjî û hwd. Piştî her du şerên cîhanê ku bi milyonan mirov bûn gorî. Dewletên kapîtalîst dîtin ku wê nikaribin beramberî hêz, vîn û îradeya gelan temenê xwe bi şideta fizîkî dirêj bikin; serdestiya xwe bisepînin û berjewendiyên xwe bi dest bixin. Ji ber wê amûrên ku mirov bi kar tînin weke zanist, teknîk, spor, tendirustî, zayendî û hwd. tev kirin binê kontrola xwe. Li ser Kurdistanê jî bi 100’ê salan şerê taybet hat meşandin, lê piştî derketina Tevgera Azadiyê û belavbûna fikrê Rêber Apo, berxwedana li dijî şerê taybet li Kurdistanê hat destpêkirin. Lê bi komployeke navneteweyî di sala 1999’an de Rêber Apo ji Nîrobî hat revandin û radestî dewleta Tirk a faşîst hat kirin, ji roja dîlgirtina Rêber Apo û heta niha, li dijî wî tecrîdeke giran tê meşandin.

Herî dawî ji bo azadiya Rêber Apo Kampaniya cîhanî ya bi duruşmeya ‘Ji bo Rêber Apo azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî’ li 74 navendên cîhanê hat destpêkirin û niha jî zêdetirî 100 navendên cîhanî derbas kir. Roj bi roj kampanî firehtir dibe û li cîhanê deng dide.

Di derbarê şerê taybet yê ku li dijî ciwan, jin û civaka kurd tê meşandin, herwiha derbarê Kampaniya Cîhanê ya azadiya Rêber Apo, hevserokê Encûmana Ciwanên Kurd Rodî Hesen ji rojnemeya me re axivî.

Rodê Hesen diyar kir ku armanca dewletên dagirker ewe ku ciwanan bi madeyên hişbirê têk bibin û wiha got: “Dewleta tirk a dagirker bi siyaseta xwe ya qirêj ku civakan parçe dike, dewleta xwe ava kir. Îro jî dewleta Tirk li ser civaka kurd vî şêwazî bi awayekî nûjen dimeşîne, bi riya madeyên hişbir, teşwîqkirina koçberiyê û belavkirina fihûşê dixwaze civaka kurd ji hev bixe û bê rêxistin bihêle. Di heman çarçoveyê de hekumeta Şamê jî tarzê dewleta tirk dimeşîne bi taybet madeyên hişbir li dijî ciwanan bi kar tînin, ji ber ku dizanin ku ciwan ew dînamîkê civakê ne û dixwazin civakê bi riya ciwanan têk bibin.”

**‘Pêwîste em berxwedaniyê mezintir bikin’**

Rodî wiha berdewamî da axaftina xwe û got: “Azadiya ciwanan azadiya gelê Rojhilata Navîne. Pêwîste em ciwan zihniyeta dewleta tirk a dagirker baş nas bikin û li hemberî şerê taybet ku bi awayekî qirêj tê meşandin em bisekinin, ji ber ku şoreşa kurdan bi şoreşa jin û ciwanan tê naskirin. Her wiha civaka kurd xwedî li her pêkhateyek derdikeve bi taybet ciwan cihekî pir girîng di civakê de digre. Tirsa dewleta tirk pêşketina ciwanan e, lê dive em ciwan li ber xwe bidin bi riya xwendin, lêkolîn û berxwedanî li himber vî şerî bisekinin.”




**‘Azadiya Rêberb Apo Azadiya hemû gelan e’**

Rodî Hesen balkişand li ser Kampaniya Azadiya Rêber Apo û wiha got: “Di 10’ê Cotmeha 2023’an de kampaniya ku bi duruşmeya ‘Ji bo Rêber Apo azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî’ li 74 navendên cîhanê hat destpêkirin û niha jî zêdetirî 100 navendên cîhanî derbas kir. Ev yek dide xuyakirin ku fikir û felsefeya Rêber Apo belavî hemû cîhanê bû ye. Her wiha di vê kampaniyê de em tekez dikin ku gotina Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan ‘Me bi ciwana dest pê kir, emê bi ciwana bi ser bikevin’ em weke encumana ciwanên kurd hem ciwanên MSD ê, her wiha hemû tevgerên ciwanan em tevlî vê kampaniyê bibin, bi tevgerekî hîn xurtir û aktîv, ji ber ku azadiya Rêbe Apo azadiya gelê kurd e.”

Hevserokê Encûmana Ciwanên Kurd Rodî hesen axaftina xwe bi vî rengî bi dawî kir û got: “Em bang li hemû ciwanên bakur û rojhilatê Suriyê dikin û bi hêviya tevlîbûna hemû ciwanan di vê kampaniyê de ji bo avakirina civakek azad û azadiya Rêber Apo a fîzîkî misoger bikin.”

# Talibê Zeusê Zalim: Tayip Erdogan

**Volqan Elî**

Em ê vê carê bi çîrok-mîtolojiyekê dest bi nivîsa xwe bikin. Mîtolojiya Prometeûs ku çîrokeke Yewnana Entîk a tê zanîn. Li gorî mîtolojiyê piştî ku Zeus Prometeus digire û li tehtên Qefqes li zincîrê dide, Herkul diçe û, lehengê azadiya mirovan Prometeus rizgar dike. Zeusê zalim ji vê re çavê xwe dineqîne yanî ji nedîtî ve tê.

Na, zû kêfa xwe neynin! Zeus li gorî mîtolojiyê xwedayê xirabî, nebaşî… werhasilî çi tiştê beredayî hebe li cem wî ye… hem jî zikreş e. Difikire ku Prometus û benî beşeran çawa ceza bike. Dibêje “ez ê ji birayê Prometus ê navê wî Epimeteus e heyfa xwe hilînim”. Sanemeke jineke bi qasî xwedavendan xweşik dide çêkirin, û ruh û can didê. Piştre bi dekûdolaban mejiyê wê tije dike û dişîne cem Epimeteus. Werhasil ew jin diçe û li deriyê Epimeteus dide. Birayê Prometeus çawa wê dibîne evîndarê wê dibe. Piştî çend rojan pê re dizewice. Dekûdolaba Zeus ev e: Di destê wê jinê de sindoqek heye û wekî zikê Zeus tije bi xirabiyan e. Zeus dibîne her tişt amade ye: Dema ku li ber guhê wê jinê jê re dibêje, “sindoq, xirabî”… devê Sindoqê vedibe êdî dawî li xirabî, lîstok nexweşî û şeran nayê; belavî çar aliyê cîhanê dibin.

Îcar em werin meseleya xwe, yanî Rojhilata Navîn… Niha xwendavan wê “bibêjin çi karê me bi sindoqa xirabiyan a Zeus a ketiye? Ew çîrok-mîtolojiyek e.” Ne wisa ye, ji ber ku qey tu dibêjî devikê sindoqa Zeus li vê derê vebûye. Mîtolojî jî ne bi qasî dînan be jî, ji rastiya civakan xeber didin. Di vê serdemê de rewşa herêma me jî dişibe wê sindoqa xirabiyan. Mînak, rojekê El-Qêîde, rojekê Talîban, rojekê Artêşa Azad, rojekê El-Nusre, DAIŞ… û herî dawî Hamas. Ev hemû jî hêzên wisa ne ku aliyê civakî yê Îslamê dikojînin, Rojhilata Navîn, Misilmantiyê li ber çavên cîhanê reş û tarî dikin. Jixwe ji van hêzan gelakan jî ala wan wekî DAIŞ’ê reş e. Dîsa, ecêba Xwedê ew e ku piraniya van, bi dewleta dagirker a Tirk re bi şiklekî têkildar in. Mînak, Hamas… herî dawî Ewrûpa û dewletên pişta Îsraîlê digirin hişyarî dan Erdog: Hamas terorîst e… armanca me ne ew e, em bêjin Hamas terorîst e yan na. Jixwe me ev çîroka sindoqa Zeus ji ber vê yekê anî ziman: Hemû awayekî xirabiyê ne; Hamas, Daiş, Hitler, Talîban, Boko Haram, û hezar belayên din.

Mînakeke din a balkêş; Talîban e. Tê zanîn bi gelê Efxanistanê niha dojehê dide jiyîn. Herî dawî ji bo keçan dibistan qedex kirin. Ji pêşengên wan yek jî Gulbetin Hikmetyar bû. Wêneyên wî û Teyip Erdogan di demên derbas bûyî de derketin li çapameniya cîhanê: Di wê wêneyê de Erdogan diçe destê Hikmetyar maç dike. Têkiliyên ziravtir em nizanin. Lê dema par-pêrar Talîbanan Efxanîstan girt destpêkê ew bezîn û hatin Tirkiyê; teîfeya Tayip bi axaftinên xwe dilê Talîbanan xweş kirin.

Têkiliyên DAIŞ û Tirkiyê dinya alem dizane. Jixwe gelek Emîrên wê yên giregir jî li herêm dagirkirî yên Rojava hatin kuştin. Ne tenê DAIŞ! Niha Efrîn wekî sindoqa xirabiyan e. Hezar rêxistinên cîhadîst ên zik û rûyên wan reş, li gund û kolanên Efrînê gemariya xwe belav dikin. Hemû jî bi xêra dewleta Tirk a dagirker û serokê wê Tayip Erdogan e. Dema ku destwerdana Emerîka (di salên 2003’an de) li Rohilata Navîn çêbibû Erdogan xwe wekî hevserokê hilweşandina herêmê îlan kir. Ji wê demê ve hemû rêxistin û muxalîfên Sûriyeyê perwerde kir. Pişt li Sûriyeyê şikênand. Hemû birin Îstanbol têr pere û derfet kirin. Dibe ku ji bo têkçûna Sedam alîkarî nekiribe. Yanî destûr neda ku Emerîka ji bo lêdana Iraqê baregehên xwe yên li wê derê bi kar bîne. Ya din jî piştî ku herêma Kurdistanê ava bû, wekî ku niha êrîşê Rojava dike nekir.

Wê jî li xwe mukur tê. Timî Tayip Erdogan dibêje “me şaşitî kir ku me destûra avabûna herêma Kurdan da”. Gotina wî, Başur e. vê mukurhatina xwe çawa derbas dike? Niha PDK bi temamî xistiye bin baskên xwe. Malbata Barzanî sînorên xiyanet û nokeriyê derbas kiriye û bûye qorîçiyekî wî yê kirê girtî. Bi îhtîmaleke mezin dagirkeriya Tirk hemû balyozxaneyên xwe xistiye xizmeta Barzaniyan. Di formeke navnetewî ya hawîrdorparêzan de Nêçîrvan bejn û bala xwe nîşan da. Li herêmên parastinê yên Medya bi derfetên Tirkan heta bi baregehên gerîlayên Kurd, rê çêdike: Da ku leşkerên Tirk bi ser gerîla de çekên kîmyawî bibarînin.

Herî dawî Tayip Erdogan ji hevserokatiya Projeya Rojhilata Navîn a Mezin vegerî. Hûn ê bêjin bû çi tişt? Bû Zeus… ev, di axaftina xwe ya vê (08.12.2023) dîrokê de wî bi xwe anî zima. Em bi kurtî vê gotinên wî dibêjin; ‘bila Ewrûpa û yên destekê didin Îsraîlê hişyariya xwe bikin. Eger Îsraîl wisa dewam bike, ew ê sandoqa Pandorayê veke. Hemû xirabî wê belavî cîhanê bibin”. Sandoqa Pandorayê çi tişt e? Yanî sindoqa Zeus… di hevokên destpêkê de çîrok heye. Pandora jî navê wê sanemê jina ku Zeus daye çêkirine. Tayip bi axaftina xwe, bi şiklekî ser girtî gefan li mirovahiyê dixwe. Dixwaze bêje, eger hûn wekî min nekin ez ê Hamas û hemû cîhadîstan bişînim li ser we”. Mesele ne ku ji Ereban hez dike. Ma ne dema piştî şerê cîhanê yê duyemîn Îsraîl ava bû, yê destpêkê ew nas kir dewleta dagirker a Tirk bû! Niha jî Tayip dibêje, Îsraîl çima Misilmanan dikuje! Tayip rast dibêje yan dewleta dagirker wê demê karekî rast kiribû? Kîjan rûyê rast ê dewleta Tirk û Tayip Erdogan e?



# ‘Çareseriya pirsgirêkên gelên bindest azadiya Rêber Apo ye’

Kampaniya cîhanî ya azadiya Rêber Apo bi awayekî çalak dewam dike, herî dawiyê di çarçoveya kampaniyê de çalakiya komkirina imzeyên parêzeran li ser asta Sûriyê pêk hat. Ferzende Munzir diyar kir ku gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bi awayekî çalak tevlî Kampaniyê bûn û got, azadiya Rêber Apo azadiya gelên bindest e.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Bi daxwaza azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan û çareseriya pirsgirêka Kurd di 10’ê Cotmehê de Kampaniyek bi dirûşmeya ‘Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî’ hat destpêkirin û li zêdeyî 100 welatên cîhanî pêk hat, herwiha li 5 perzemîn, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlesof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî pêştgirî dan Kampaniya “ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî.”

Di derbarê kampaniya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo Berdevkê Insiyatîva Sûriyê ya azadiya Rêber Apo Ferzende Munzir ji rojnameya me re axivî.

Ferzende Munzir diyar kir ku kampaniya cîhanî ya ji Rêber Apo re hat destpêkirin gelek bi wateye û wiha got: “ Kampaniya ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dest pê bû gelek bi wateye, ji ber ku kesên ku tevlî bûne, mirovên cihekî wan taybet di nava civak û raya giştî heye, wek; Rewşenbîr, Hiqoqnas, Akadimisyan, feylesof, kesên ku xelatên nûbel birine, wekî din jî rêxistinên civaka sivîl,



sandîkeyên karkeran ku bi melyonan endamên wan hene. Herwiha roja destpêkirina kampaniya yê, di salvegera kompiloya navnetewî bû ev jî nameyek ji bo kesên kompiloger re bû. Kompilo cîhanî bû, pengav jî li hemberî wê cîhanîye. Pengav ku ji bo azadiyê bû, niha bû tevgereke cîhanî ji bo azadî û demoqrasiyê. Di heman demê de nameya 74 navendên cîhanî ew e ku temên Rêber Apo bûye 74 sal, ev jî wateya wê heye. Ji xwe destpêkê li pênc parzemînan bû, niha jî zêdeyî 100 welatên cîhanî derbas kir.”

**‘Çareseriya pirsgirêkên gelê bindest Rêber Apo ye’**

Munzir wiha axaftina xwe berdwam kir Rêber Apo li hemberî hûm sûcên dijmirovahiyê berxwedaneke mezin di girtîgeha îmraliyê de dide meşandin û wiha got: “Ev 25 sal in Rêber Apo di girtîgehekê ku di nava giravek derveyî pîvanên tenduristiyê ye jiyan dike. Şiliya girava imraliyê zêdeyî 60 ye, herî zêde divê şilî ji bo mirovan ji sedî 60 be, lê şiliya vê giravê ji sedî 60 heya 80 ye, bi demê re ziyanên mezin li bedena mirovan dike û mabûn tenê tecrîdekî derveyî mafên mirova ye. Rêber Apo berxwedaneke mezin di girtîgeha îmraliyê de li hemberî hûm sûcên dijmirovahiyê dike. Rêber Apo ne tenên têkoşer ji bona azadî û demoqrasiyê ye, di heman demê de feylesof, zanyar û hizirvaneke ji bo gelê bindest û bi pirsgirêkên mirovahiyê mijol dibe, herî girîng jî çareseriya wan pirsgirêkan Rêber Apo ye.”

**‘Pirsgirêka kurd bûye pirsgirêkeke cîhanî’**

Ferzende Munzir di dewamkirina axaftina xwe da diyarkirin ku pirsgirêka kurd bûye pirsgirêkeke cîhanî û wiha got: “Îro pirsgirêka kurd bûye pirsgirêkekî cîhanî, bandora wê Rojhilata Navîn jî derbas kiriy e, çareseriya van pirsgirêkan azadiya Rêber Apo ye. Em jî wek gelên Bakur û Rojhilatên Sûriyê û him Insiyatîva azadiya Rêber Apo bi rolekî bingehî di kampaniya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo cih girt. Herwiha wek Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî, ev zêdeyî 2 mehan tevlîbûna me ji kampaniya yê re bi hemû saziyên heyî mîna Komîn, Meclis, Saziyên Malbatên Şehîdan, Şaredarî, Rosipî, Êl, Parêzer, Bijîşk, jin û ciwan heye û hîn jî dewam e. Her kes ji bo azadiya Rêber Apo




li ser lingaye, di riya daxuyanî, çalakî, konvedan, meşên mezin, civîn. Komcivîn, konfirans û ya herî girîng jî 104 zindan yên girtiyên tevgera azadiyê, li Bakur di riya girava birçîbûnê de tevlî kampaniya yê bûne. konfiransa ciwana ya cîhanî jî li Ewropayê ji bo azadiya Rêber Apo dest pê bûye, di heman demê de jî xwendina pirtûkên Rêber Apo û nîqaş li ser wan ji aliyên kesên zanê ve tên kirin, herî dawî jî me Konfiransekî hiqoqî û tenduristî li bi tevlîbûna zêdeyî 300 kes ji Bijîşk, Parêzer, Rewşenbîr û çalakvan li dar xist.”

**‘Di mehekê de 1025 îmze ji parêzeran hat komkirin’**

Berdevkê Insiyatîva Sûriyê ya azadiya Rêber Apo Ferzende Munzir axaftina xwe wiha qedan: “Komkirina imzeyên parêzeran li ser asta sûriyê ye ku ji Heleb, Şam û Lazqiyê jî hebûn, ew jî ji bo Efwa cîhanî ye, Efwa cîhanî ne rêxistineke hikumiye lê bandora wê heye, netewên yekbûyî wê bingeh digire. Di mehekê de 1025 îmze ji parêzeran hat komkirin. Em dixwazin di riya van îmzeyan de ku dengekî xwe bikin, ji ber rolekî Efwa cîhanî heye û gerk bi erkê xwe rabe. Herwiha ji bo kampaniya bêghêje armanca xwe ya sereke, dive hîn zêde çalakiyên pir reng bên kirin û em zextekê li ser rêxistinên mafên mirovan bikin, ya din jî ku di hundirê Bakur de rabûn hîn bêtir bibe. Pengava cîhanî li gorî pengava yekemîn hebû, di demên pêş de wê li gorî pengava duyemîn be.”

# Komkujiya Parîsê wê bêbersiv nemîne

**Navenda Nûçeyan/ Qamişlo**

**Di 23’ê berfanbara 2022’an de, Bi armanca şikandina vîna gelê Kurd,li Parîsê li dijî Komeleya Çanda Kurd ya Ahmet Kaya êrişeke hovane hat kirin û di encamê de endama Konseya Rêveber a KCK’ê Emîne Kara (Evîn Goyî), hunermend Mîr Perwer û welatparêzê Kurd Abdulrihman Kizil şehîd bûn. Komkujiya Parîsê ya duyemîn dewamiya siyasetên qirkirina gelê kurd e, dewleta Firansa li şûna ku edaletê pêk bîne li ser kujer û hevkarên komkujiyê nixumand. Li hemberî wê jî gelê kurd asta têkoşînê blindtir kir û soza tolhildana şehîdan nû kir.**

Bi nêzîkbûna salvegera komkujiya Parîsê ya Yekem, Di 23’yê Kanûna 2022’yan li paytexta Fransa Parîsê êriş li ser Komeleya Çanda Kurd ya Ahmet Kaya hat kirin. Di komkujiyê de Endama Konseya Rêveber a KCK’ê Emîne Kara (Evîn Goyî), hunermend Mîr Perwer û welatparêzê Kurd Abdurrahman Kizil şehîd bûn, 3 kesên din jî birîndar bûn. Ev komkujî berdewamiya komkujiya yekem bû û bi armanca şikandina vîna gelê azadîxwaz bi taybet jinên berxwedêr hat kirin. Li hemberî wê jî, gelê kurd li tevahiya cîhanê êriş bi tundî şermezar kirin û banga edaletê kirin.

**Evîn Goyî pêşenga jinên azadîxwz e**

Evîn Goyî, ji wan jinên pêşeng bû ku beriya 34 salan ji bo azadiya gelê xwe li çiya, deşt û zozanên welatê xwe geriya. Li Rojava, Şengal û Ewropayê di riya heqîqetê de têkoşîn meşand. Xemla têkoşîna 34 salan li ba wê hûnandi bû. Ji temenê zarokatî hetanî roja pakrewaniyê, li ber xwe da. Xisleta xwe bi têkoşînê rêxistin kir; di avakirina hestên xwe de jina bi hêz a şoreşger bi cih kir. Di jiyana xwe de felsefeya xeta jinên azad bi rêgêzên bîrdoziya rizgariya jinan re herikand. 34 salan di her şert û mercên zehmet ên şoreşa Kurdistanê de, ruh, dil û mejiyê xwe ji bo pêşxistina têkoşînê xebitand. Hemû lêgerînên Evînê, di xizmeta têkoşîna azadiyê de bûn. Cihê Evîn Goyî di dîroka jinan de, cihekî taybet bû. Di nav tevgera jinên kurd de, naskirî, xwedî cihekî zana bû. Hestên wê yên kûr, pêla rêhevaltiya sira jinên pîroz dizanî wê biherikîne ku. Di xeyalên Evîn Goyîyê de, hêmanê şoreşa dînamîk rêxistin bû lê ya girîng meşa piştî şoreşê, parastina destkeftiyên şoreşê bû. Ji wê li rojavayê Kurdistanê, bê hesap tev li meşa jinûveavakirina pergala şoreşê bûbû.



**Mîr Perwer û Apê Ebdûrihaman girêdayî doza gelê xwe bûn**

Şehîd Mîr Perwer, hunermendekî ciwan bû, dilê wî ji bo azadiyê lê dida, ruhê wî li ba berxwedana gerîlayên azadiyê mezin dibû. Mîr, dilsozê şopa nemir şehîd hozan Serhed bû. Apê Abdûrehman, welatperwerekî esîl, girêdayî doza gelê xwe bû. Yek ji Apociyê kevin ê Qaqizmanê bû! Bîra wî, ji ezmûna dîroka berxwedanê bû.

**Dewleta Firansa li ser kujeran dinxumîne**

Li bajarekî wekî Parîsê ku bi ewlehiya xwe tê nasîn, ev dûyem êrîş li ser pêşengên Kurd û bi taybetî li ser jinên têkoşer hate kirin. Di 9’ê Çileya 2013’an de jî, sê pêşengên şoreşger yên tekoşîna azadiyê Sekîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şeylamez li bajarê Parîsê ji aliyê istixbarata dewleta tirk ya faşîst ve hatin hedef girtin û şehîd bûnTevî ku dewleta Tirk a dagirker bi awayekî eşkre komkujiya Parêsê ya yekem û duyem pê anî anî jî , lê dewleta Firansa heyanî vê kêliyê komkujiya Parîs ya yekemîn û ya duyemîn ronî nekiriyê û tersî wê li ser kujeran dinixumîne û xwe berpirsyar nabîne.